Kurmanci

NAMEYA PARASTINÊ

Li hemberî Nivîşkankirina Organê zayendî yê Jinan (Sinetkirina Jinan)

Tu divê dema gerr û sefera bo derveyî Almanyayê hertim vê daxûyaniyê hevrê digel xwe bibî. Bi vî awayî tu dikarî bi awayekî ron û zelal ji malbata xwe ra bibêjî ku Nivîşkankirina Organê zayendî yê Jinan (FGM) li Almanyayê sûcek e ku jibo wê cezaya zîndanê tê sepandin

Hamburg

Gelo te pirsek heye?

Eger ku te pirsek li bara nivîşkankirina Organê zayendî yê Jinan heye, dikarî bi rêya telefonê an serxet (Online) digel telefona Alîkarîgihaniya dewletê jibo sekinîna dijî Tundiya dijî Jinan bikevî têkilîyê. Telefona Alîkarîgihan bi 17 zimanan – 24 saetên şev û rojê – rawêjkariyê raber dike.

HILFE TELEFON
GEWALT GEGEN FRAUEN
08000 116 016
www.hilfetelefon.de

Vê belgeyê hevrê digel belgeyên sefera xwe bi awayekî ewleh xwedî bike da ku di gerr û seferên bo derveyî Almanyayê hertim digel te hebe.

Navnîşana Weşanê
Bajarê Azad û Hanzeya (Hansestadt) Hambûrgê
Rêveberiya Kar, Karên Civakî, Malbat û Sazbûna Civakî (Entegrasiyon) beşa pêwendiyên giştî û çapemenî bi navnîşana Hamburger Str. 47, 22083 Hamburg

Navnîşana Siparişê:
Rêveberiya Kar, Karên Civakî, Malbat û Sazbûna Civakî (Entegrasiyon) beşa Navendî ya şandina Broşûrê
Telefon. 040 / 428 63-7778
E-Mail: publikationen@basfi.hamburg.de

Nivîşkankirina Organê zayendî yê Jinan (FGM) çî ye?

Nivîşkankirina Organê zayendî yê Jinan an FGM (Female Genital Mutilation) birrîna tam an beşeka Organê zayendî yê Jinan yê derveyî ji ber sedemên ne-bijîşkî ye. Ev kar wek Binpêkirina Mafên Mirovan tê zanîn.

Nivîşkankirina Organê zayendî yê Jinan jibo saxlemiyê gellek ziyandar e

FGM renge bibe sebeba pirsgirêkên hetahetayî yên têkildarî saxlemiyê. Renge keçik ji ber vî karî tûşî xwînhatinê bibin an ji ber xedarbûna birînê jiyana xwe ji dest bidin. Gellek jin di temenê xwe da ji ber êş û nerihetiyên bedenî û rûhî yên mayînde rencê dikişînin, wek. Mînak:

- Êşa dema mîzkirinê û dema pêkanîna têkilliya zayendî, Mîzkirina bê hemdê xwe, pirsgirêkên giran ên Peryodê, her wiha
- Kêmgirtina Mîzdank û Malzarokê.

Dûhatên din renge ji babetên li jêrê bin:

- Nezabûn (Zarokneanîn), Pirsgirêka di dema zarokanînê an Damayînên giran.

Nivîşkankirina Organê zayendî yê Jinan qanûnên Navneteweyî û Qanûnên Almanyayê binpê dike

FGM li Almanyayê wek Sûc tê zanîn. Her kesek ku Organê zayendî yê Jinan nivîşkan bike an bixwaze vî karî bike, dê tûşî Cezaya Zîndanîbûnê bi qasî 15 salan were. Ev yek di rewşa ku cihê pêkanîna Sûcê li derveyî Almanyayê be, jî rast e.

Dêbavên keçeikê ku li nav an derveyî Almanyayê Organê Zayendî yê Keçika xwe nivîşkan dikin û dibirrrin an kesên din han didin ku vî karî bikin jî dê bikevin bin şopandina qanûnî.

Xwesta bo nivîşkankirina Organê zayendî yê Jinan an pêkanîna wê yekê renge bibe sebeba wê yekê ku navendên dewletî bi awayê demkî an hertimî keçikê ji malbata wê bistînin û Dêbavên keçikê renge ku mafê xwe yê sergêrîyê ji dest bidin.

Eger darizandin û cezakirin pêk were, dêbavên ku mafê xwe yê welatîbûna Almanyayê tunene, renge ji billî vêya, mafê xwe yê Jiyana demkî an hertimî li Almanyayê ji dest bidin

Keçik divê bikarin bi awayekî pareastî û di bin sîvana piştgiriya li hemberî her cûre neçêbikaranînê û ziyana dijî tendurustiyê, mezin bibin. Ev erka dewletê ye ku hewil bide babetên binpêkirina van mafên zarokan û jinan bişopîne û sebebkaran ceza bike.

M. Leonhard
Sênatorê kar, Karên Civakî, Malbat û Sazbûna Civakî (Entegrasiyon)

Sênatorê karên tendurustiyê û Piştgiriya ji bikarêneran

Sênatorê Dadweriyê

Sênatorê Karên Navxweyî û Spor